

Pêşgotina her pênc k'itêbêd Mûsa

Xwendevanêd delal! Cara e'wlin e ku ev her pênc k'itêbêd Mûsa destê weda ye, k'îjan ku dik'evine nava p'arêd Bîblîyayê. Ev k'itêb bi zaravê kurmancîya k'urdî hatîye welger'andinê. Bîblîya k'itêba k'itêba ye, k'itêba here hêja ye û gelek tê xwendinê. Cihû, musulman û mesîhî van her pênc k'itêbêd Mûsa qebûl dikin çawa k'itêbêd pîroz.

Her merivê li ser t'opa dinîyayê, k'îjan qulbîda ku dimîne, çi miletî yan xweyê çi h'ebandinê be, wî dik'eve ku vê k'itêbê bi zimanê xwe bixûne. Bîblîya caba wan pîrsa dide, k'îjana ku t'imê serê cime'tê êşandine, mesele: em ji ku bûne, em çima dijîn, çima dinyayêda haqas xirabî heye, pey mirinêra çi tê serê mêriv.

Bîblîya t'evayîya xweva şêst şeş k'itêb in, k'îjan ku bi destê gele nivîsk'ara navbera gelek salada hatine nivîsarê. Ev k'itêbana derheqa serhatîyêd ji destpêbûna dinyayêda girtî h'eta qurna yekêye pey bûyîna Îsar'a dibêje. Bîblîya li ser du p'ara p'arevedibe. Peymana Nû, k'îjan ku derheqa bûyîn, kirêd Îsa û peyçûyêd wî, usa jî derheqa pêşdaçûyîna civîna e'wlin berbiç'ev dike.

Peymana Kevin nav xweda dite'milîne her pênc k'itêbêd Mûsa, usa jî k'itêbêd p'êxembera û hilbesta. Her pênc k'itêbêd Mûsa ne t'enê yêd e'wlin in, lê usa jî yêd e'sasî ne, bona t'emamîya K'itêba Pîroz. Ew bona pêşdahatina dinê, însên, pêşdahatina gunah, heleqetîya Xwedê û însên dibêje.

Her pênc k'itêbêd Mûsa ji têkista îbranîye kevin, awa gotî ji têkista Masorêtî bi zimanê k'urdî hatîye welger'andinê.

Cî-cîya tiştê ji têkistê dûrk'etî şirovekirinêda tê e'yankirinê.
Xilazîya k'itêbê: ferhengok û xerîte heye.

Înstîtûta welger'andina bîblîyayê r'azîbûna xwe dide:
welger'a, serr'astkîra usa jî h'emûyêd ku t'evî k'arê hazirkirin
û xebata çapkirina her pênc k'itêba bûne.

Înstîtûta welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva